Çi demek bo nîşandana ner-azîbûnan bicî ye?

»»» R:5

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (327)05-06-2018 Buha (1000) Tûmen

Derketina Amerîkayê ji rêkkevtina navikî

»»» R:3

Demsala ketinê

»»» R:2

Tirsa rejîmê ji serhildanê

www.arsivakurd.org

Piştî vekişiyana Amerîkayê ji Bercamê bi biryara Trump, û vekişiyana beşeke berçav ji bank û kompaniyayên mezin ên cîhanî ji Îranê, bi sedema dorpêçên navneteweyî, tirsê hemû cendekê rejîmê dagirtiye.

Di axavtina herî nû ya Xamineyî de, navbirî di 29.mîn salvegera mirina Xomêynî de ferman da Saziya Enirjiya Etomî ku bilez hêsankariyan bikin bona zêdekirina asta mehandina Uraniyomê bi qasî 190 hezar "SWU"yan.

Navbirî herwisa bas ji pirsa sazkirina mûşekan û berdewamiya pirograma mûşekî ya rejîmê kir, û ragehand: "Dijminên me dixwazin ku bi zexta aborî, derûnî û piraktîkî, me bixin qedemna, lê mûşek ji me re nîşana ewlehiyê û xala bihêz ya me ye, û serweriya me di navçeyê de misoger dike!."
Navbirî herwisa wekî serkomarê rejîma xwe got ku Amerîka dixwaze ku xelkê berde canê rejîma me.

Axavtinên wî ku cureyek ji tirs û gefxwarinan pêve xûya bû, di demekê de bûn ku paş vekişiyana Amerîkayê ji Bercamê çendîn kompaniya û bankên mezin ên cîhanê bi sedema egera dorpêçên Amerîkayê ji Îranê vekişayane, yan jî ragehandine ku di pêşerojê de wê vekişin.

Ew rewşa hevdem digel sepandina gereke nû ji dorpêçan li dijî kesayetiyan û navendên ser bi rejîmê ji aliyê Amerîkyê ve bandoreke wisa li ser rewşa derûnî ya civakê kiriye, ku herwekî ku çalakên siyasî di navxwe de bas dikin, bazerganên navxweyî hêdî-hêdî sermayeyên xwe ji bazarê vedikişînin, û pêleke berfireh ji giranî û şikestxwarina kargehan û karxaneyên berhemhîner dest pê dike, ku di encamê de asta bêkariyê zêde kiriye, ku hemû ew bûyerane li ser hev rewşa derûniya xelkê aloz û tevlîhev dikin.
Xamineyî di demekê de bas ji tevdanîkariyên "dijmin" dike, ku di çend hefteyên borî de di çendîn bajarên Îran û Kurdistanê de, xelk li hemberî siyaseta qirkirina ji aliyê rejîmê ve rijiyane ser kolanan, yan jî li hemberî siyasetên dijîmirovane ên rejîmê girev girtin, ku ya herî berçav gireva dukandaran û bazariyên bajarê Bane û gireva kamyondaran li Îran û kurdistanê, û civînên nerazîbûnê ên xelkê Kazirûnê û meşa nerazîbûnê ya kedkarên Hêpko bû.
Ya ku gellek eşkere ye ew e ku piştî vekişiyana Amerîkayê ji Bercamê û vegeriyana tehrîmên berê û sepandina dorpêçên nû hevdem digel kurtkirina destên Îranê ji navçeyê û bidawîanîna bi cilîdanê ya rejîmê di navçeyê de ku metirsî ye li ser berjewendiyên navçe û cîhanê, ew yek dibin sedema şikestên mezin di biyavê siyasî, aborî, û îdeolojiya rejîmê de, û bi dûr nahê zanîn ku ew zextên siyasî û aborî, gelên Îranê rakêşe ser şeqaman, da ku bi awayekî micidtir ji berê li dijî rejîmê û siyasetên wê serî hildin, lewra em dikarin bêjin ku ew axavtinên vê carê ên Xamineyî "nîşana tirsa wî ji serhildanê ye!"

Sergotar

Demsala ketinê

N: Kerîm Perwîzî

Di qonaxên hestiyar ên dîrokê de, rûçikên veşartî zêdetir ji caran xwe eşkere dikin. Hekî berê kiryar û axavtin tenê bo kesên gellek pispor, û hekî gotî "xwedîhizran" zelal û cihê jêfêmkirinê bû, û dizanîn ku çi bîrkirinek li pişta axavtinên bi berçav ciwan ên wan xwe veşartiye, di qonaxên hestiyar de êdî neçar dibin xwe eşkere bikin, û hemû kes bi rohnî rûçikê wan yê veşartî dibîne.

Di Îranê de bi sedema tawanan û hovîtiyên Komara Îslamî ya Îranê, sedan hezar kes hatine kuştin, û bi milyonan kesî malwêran û aware bûne, û li ber van tawanên mezin ku di heyama çil salên borî de bi rê ve biriye, gellek kes û alî û rewtên siyasî di hemberî van hovîtiyan helwest girtine, û xelkê jî pişta wan kes û aliyên xwedîhelwest girtine.

Di nava wan cure kes û aliyan de hebûn û niha jî hene kesên ku helwesta wan li dijî Komara Îslamî bi sedema baweriya wan ya cuda nine, belku tenê li ber vê yekê ye ku xwe di deshilatê de nînin, û hekî rejîmê libeke şîrîniya deshilatê daba wan, wan jî wê qamçiyek li dijî xelkê bi kar anîba.

Di heyama çend salên borî de, kesên weha gellek hatine û çûne, û niha jî hene kesên wisa ku formên curbicur bi xwe ve girtine. Carekê bi navê reformxwaziyê, carekê bi navê vegeşandina gotara demokrasiyê, carekê bi navê dijberiya şer û malwêraniyê û ...hwd, xwestek û vîna hundirîn ya xwe veşartine, û gellek caran rûçikê azadîxwazî û alîgiriya ji mafê xelkê ji xwe nîşan dane.

Bona vê ku em gellek ji mijarê dûr nekevin, em bi zelalî dikarin îşareyê bi kevnelêpirs û îşkencegerên SAWAK û Spaha

Şandekî Hizba Demokrat seredana nûneratiya partiya Demokrat a Pêşvero ya kurd kir

Şandekî Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, seredana nûneratiya Partiya Pêşvero ya Kurd a Sûriyê li bajarê Silşmaniyê kir û pirsên têkildarî kurdan gengeşe û nirxandin.

Şandekî PDKÎ bi serokatiya Mihemednezîf Qadirî, endamş Desteya Kargêrî roja înê, 4ê xermanana 1397 a rojî seredana nûneratiya partiya Yekîtiya Demokrat a Pêşvero ya kurd li bajarş Silêmaniyê kir û ji aliyê "Elî Şemdîn" endamê Mekteba Siyasî û nûnerê wê partiyê li Herêma Kurdistanê hat pêşwazî kirin.

Di wê serdanê de her du aliyan bas li ser pirsa kurd di hemû beşên Kurdistanê û bi taybet Rojava û Rojhilatê kirin û guhertinên deverê niqaş û nirxandin. Li daviyê de her du aliyan tekezî li ser bihêzkirina pêwendiyan kirin.

www.arsivakurd.org

Pasdaran û dezgeha Îtila`ata rejîma Tehranê bikin, ku çûne derveyî welat, û di qonaxekê de xwe wekî zulmlêkirî nîşan daye, û rûçikê dijberiya komara sêdareyê bi xwe ve girtiye!.

Yan jî di nava rewtên fikrî ên dijî rejîman de kes û aliyê weha hene ku bîrkirina wan şovînîstî ye, û li jêr navê demokrasîxwaziyê û diruşmên din de xwe veşartine, lê di bingeh de her wekî Komara Îslamî bîr kirine, û di hemû kom û civînan de mînakên weha peyda bûne, ku gotinên wan rûçikeke demokratîk hebûye, lê niyet û sedema dijkiryarên wan vedigere ser têkdana civînekê û hizra faşîstî ya wan.

Ew cure rûçikane, di awayê asayî de rûçikeke îroyîn û azadîxwazane bi xwe ve digrin, lê di qonaxên hestiyar de, ya di hundirê xwe de zelal dikin, herwekî ku di van çend mehên borî de, Komara Îslamî ketiye bin zexteke rastîn ya cîhanî de, ku êdî maskên ber çavên xwe vêde bidin, û bi eşkere û bêşermane berevaniyê ji rejîma tawan û sêdareyê dikin. Ji hemiyê ecêbtir ew e ku kesaneka di vê heyamê de maska ber çavên xwe vêde dane, û bergirî ji rejîma Îslamî ya Îranê dikin ku kesûkar û hevriyên herî nêzîk ên wan jî bi destên Komara Îslamî hatiye îdamkirin, yan jî di girtîgehê de li jêr îşkenceyê de hatiye kuştin!.

Vêdedana maska ber çavên xwe ji aliyê wan kesan ve, û bergiriya wan ya bêşermane, herçend ku diyardeyeke tall ya siyasî ye, ku rûçikê xebatkarî û tekoşîna wan lekedar dike, lê nîşanderê vê rastiyê ye ku hemû aliyekê ew yek fam kirine ku rejîma faşîstî ya mezhebî ya hakim di Îranê de ber bi nemanê ve diçe, û evane lewra maska ber çavên xwe davêjin, da ku bi her awayekî ku bûye, sîstema serberedayî û qorixkarane li Tehranê û navenda Îranê biparêze, lê diyar e ku dîrokê biryareke din daye.

Derketina Amerîkayê ji rêkkevtina navikî

Îdrîs Ehmedî

Vekişiyana Amerîkayê ji rêkkevtina etomî digel Îranê, çaverênekirî nebû, yan aliyê kêm hetmî bû. Serbarê narazîbûna Trump ji vê rêkkevtinê, heta berî hilbijatina navbirî jî wekî serokê Amerîkayê, di asta navxweyî û navdewletî de, vê rêkkevtinê piştevan hebûn û hene jî. Ji aliyekî din ve îdareya Trump bedîl bo vê rêkkevtinê tunbeû, herweha serbarê girtine pêş ya siyaseta devkî ya tund li hemberî Îranê de amade nbeûye ku têçûya guherîna rejîmê dide.

Piştevaniyên navxweyî û navdewletî bo vê rêkkevtinê her di cihê xwe de ne. Dijberên îdareya Trump di navxwe û di asta navdewletî de pêdagirane hewl didin bo ragirtina vê rêkkevtinê, bi taybetî YE, ku wisa bû di vî warî de, guherîn pêk nehatiye.

Ya ku hatiye guherîn hevsengiya hêz e di îdareya Trump de. Serbarê vê ku Trump di destpêkê de ji vê rêkkevtinê nerazî bûye, lê Wezîrê pêşîn ê Karûbarê Derve yê Amerîkayê "Rex Tillerson" û herwisa rawêjkarê ewlehiya neteweyî yê berê "McMaster" û Wezîrê Parasatinê "James Mattis" hevhizir bûn li ser mana Amerîkayê di vê rêkkevtinê de.

Bi vêdedana "Rex Tillerson" û "McMaster" û danîna "Mike Pompeo" û Bolton di cihê wan de, Trump du kes di postên kilîdî de danîne, ku daxwazkarê siyaseta tundtir in di hemberî Îranê de, ne tenê di asta siyaseta devkî de, belku di piraktîkê de jî. Wezîrê Parsatinê kevne jeneral e, kesek e ku zêdetir fêr bûye ku fermanan cîbicî bike, lewra digel vê ku pêştir hevbîrê "Rex Tillerson" bû, lê bi tenê nekarî serokê welatê xwe ji vê biryarê poşman bike, û ji ferman û biryara wî jî derneket.

Li derveyî guherîna hevkêşeya hêzê di nava îdareya Trump de, ku di berjewendiya alîgirên siyaseta tundtir di hemberî Îranê de ne, sê fakterên din rola xwe hebûn, di vê yekê de ku Amerîka cara dawiyê ji vê rêkkevtinê de derkeve.

Sedema yekem girêdayî ye bi têgihîştina Trump ji siyaset û metoda siyasetkirinê. Trump ezmûn û ceribandinên wî di bazerganiyê de hene, û wekî ksekî bazergan, siyasetkirinê wekî rikeberiya aborî dibîne, herweha jêve ye ku xala lawaz a ya wan, yan jî xala bihêz ya her aliyekî ji pêgeha aborî ve çavkanî digire, jiber ku hêza leşkerî û dîplomatîk bi dirêjkiriya hêza aborî dibîne. Trump herwisa bi xwendina hêza lawaz û bihêz ya aliyê hember hewl dide rêkkevtinê di berjewendiya Amerîkayê de misoger bike. Ji dîtingeha Trump ve rêkkevtin nikare hertimî be, û li ber ronahiya hevsengiya hêzê, bo pêdeçûn û heya hilweşandinê jî dibe. Hekî tercome bikin bi "qada dîplomasî",Trump jêve ye ku hekî aboriya aliyên hember û neyar bixin jêr zextê de, dawî car di biyavê siyasî de wê tenazulê bikin. Ev têgihîştina ji siyasetê ku rawêjkaran wekî "nasyonalîzma aborî" hesibandine, ji wê demê ve ku Trump hatiye ser kar, di koma siyaseta derve ya Amerîkayê de reng vedaye. Ji rêkkevtinên tîcarî ve bigre heya rêkkevtina Parîsê di warê jîngeh û herweha siyaseta li hemberî Kureya Bakur û Îranê, ku em şahidê vê rastiyê bûn.

Ku vedigere ser Îranê, Trump kêşe digel rêkkevtina bi Îranê re nine, belku kêşe digel vê rêkkevtinê heye ku îdareya pêşîn digel Komara Îslamî girê da, ku di berjewendiya Îranê û bi zirara Ameîkayê bû.

Faktera duyem: Vegeşandina nifûza Îranê ye di Rojhilata Navîn de. Vê yekê jî heya astekê Komara Îslamî ji armanca bidestxistina serdestiyê di gellek cihên jeostratejîk wekî Îraq, Sûriye, Lubnan û Yemenê nêzîktir kiriye. Şer û nearamî di van cihan de alîkarê Îranê bûn di pêxema zêdekirina nifûza wê di Rojhilata Navîn de. Lê di heman demê de hilgirtina dorpêçan û destpêregihîştina rejîma Îranê bi perê zêdetir alkarê Îranê bûye, da ku zêdetir di Îranê de nifûza xwe vegeşîne. Rêkkevtina navikî ne tenê çareyeke dayimî nebû bo kirîza navikî ya Îranê, belku pêgeha rejîmê di Rojhilata Navîn de bihêztir kir. Ew rastiya tevî pêşkevtina pirograma mûşekî ya Îranê û herweha avakirina hizûra nizamî ya berçav di Sûriye de, yan jî li rex Îsraîlê, metirsiya hejmoniya leşkerî û siyasî ya Îranê di Rojhilata Navîn de berçavtir kiriye.

"Mike Pompeo" û "Bolton" û hinek kesên din dibêjin ku ew rêkkevtin sînordar e bi pirsa navikî, di demekê de ku Îran di warê mûşeksaziya dûrhjavêj û piştgiriya terorîzmê û destêwerdana di welatên Rojhilata Navîn û pêkanîna nearamiyê di navçê de desteke bilind heye, û dibe ku ew pirs jî bêne berçavgirtin.

Cihê îşarepêkirinê ye ku ji wê demê ve ku Amerîka wekî mezinhêzeke derekî di Rojhilata Navîn de cihê Birîtaniyayê girtiye, sê berjewendiyên stratejîk diyarî kirine, ku amade ye ku hekî pêwîst be di pêxema wan de şerê aborî di forma sepandina dorpêçên tund heya bikarbirina hêza leşkerî bigre pêş, ku ew sê berjewendî ew in:

1-Misogerkirina veguhastina nefta Kendawê bo bazara navdewletî bi nirxa pêwîst.

2-Parastina hevpeymanên xwe, û li serveyî hemiyan Îsraîl ji metirsiya ewlehiyê

3-Herweha rêgirtina ji vê ku hêza navçeyî yan derekî di aliyê leşkerî de, bi ser navçê de xwe bisepîne, yan bibe xwedîhejmonî.

Her ew berjewendiyane bûn ku wisa kir ku Amerîka piştî dagîrkirina Kowêytê hêza leşkerî ya Îraqê têk bişîkne, û piştre hem Îran û hem jî Îraqê bixe jêr dorpêçên tund di forma stratejiyekê de, li jêr navê "lêpêçana du alî".

Piştre ku eşkere bû ku Îranê pirograme veşartî bo berhemanîna çeka navikî heye, dorpêçên li ser Îranê tundtir kirine bi armanca xistine qedeman ya Îranê. Niha derketiye ku bi valahiya deshilatê di Rojhilata Navîn de tevî zêdebûna nifûza Îranê di navçeyê de, her sê berjewendiyên stratejîk ketine jêr gefên cidî de, û Îdareya Obama jê derkeve, li pxema

Trump ezmûn û ceribandinên wî di bazerganiyê de hene, û wekî ksekî bazergan, siyasetkirinê wekî rikeberiya aborî dibîne, herweha jêve ye ku xala lawaz a ya wan, yan jî xala bihêz ya her aliyekî ji pêgeha aborî ve çavkanî digire, jiber ku hêza leşkerî û dîplomatîk wekî doma hêza aborî dibîne

rêkkevtina digel Îranê amade bû baca mezin di rêkkevtina digel Îranê bide. Her îdareyeke din jî li ser kar bûya, dibûya ku bersivder be di hemberî vê rewşê de, û ew metirsiyên ku ji aliyê Komara Îslamî ve çavkanî digrin. Hekî "Hillary Clinton" wekî seroka Amerîkayê hatiba hilbijartin, renge Amerîka ji vê rêkkevtinê derneketiba, lê bêguman wê hewla dijberîkirina cidî daba bo rêgirtin ji siyaseta hejmonîxwazane ya Îranê.

Helbet Trump bi sedema têgihîştinekê ku ji siyasetê heye, tevî vê ku di hizbeke din de ye, û parastina mîratê Obama gellek jê re girîng nine, bi başî zaniye ku bo bêbandorkirina Îranê Amerîkayê vekişîne ji vê rêkkevtinê. Xaleke din ya pêwendîdar ew e ku serbarê hewla hevpeymanên Amerîkayê, Rojhilata Navîn bo bêbandorkirina Îranê bi taybetî ji aliyê Erebistan û Îsraîlê ve hêza wan, pişka vê nake ku pêşiya Komara Îslamî bigrin ku hejmoniyê bi dest

www.asivakurd.org

bixe.

Xaleke din dubendiya di navbera welatên navçeyê de ye, ku wisa kiriye ku Îran bikare sanahîtir siyaseta hejmonîxwaziyê bidomîne, lewra Amerîka neçar e ku bixwe bê qadê. Wisa dixûye ku Amerîka bixwaze bi derktina ji vê rêkkevtinê welatên Ewropî naçar bike ku pêdeçûnê bi ser siyasetên xwe de bikin, ku heya niha pêk hatiye ji bihêzkirina Îranê. Faktera sêyem, şikestanîna danûstandinên Amerîka û Ewropayê bû derheq pêdeçûn yan tekmîlkirina rêkkevtina navikî digel Îranê. Eşkere nebûye ku çima welatên Ewropî digel îdareya Trump nekarîn ku bigihîjin yekdengiyê, lê tê gotin ku Amerîkayê merca wê, ew bûye ku tevî pirsa mûşeksaziyê û dewra têkderane ya Îranê di Rojhilata Navîn dibe ku çavdêriya heta-hetayî bo bernameya navikî ya Îranê bê kirin, û Ewropiyan ew yek bi dilê wan nebû, û gotin ku digel cewherê rêkkevtinê dijayetî heye. Derketina Amerîkayê piştî sernegirtina danûstandinan digel Ewropiyan rû da.

Armanca îdareya Trump ew e ku bi sepandina dorpêçan bi ser Komara Îslamî de, û lawazkirina rejîmê, neçar bin ku cardin vegerin ser maseya gotûbêjê bo wajokirina rêkkevtineke din û berfirehtir, hem di warê pirsa pêwendîdar ku li serê de îşare pê hate kirin, û hem jî di warê zemanî de. Gihîştina bi vê armancê girêdayî ye bi vê ku dorpêç çend bibandor bin, û herwisa girêdayî ye bi vê ku welatên Ewropî, û Çîn, Rûsiye, û hin welatên din di Rojhilata Navîn de alîkarê Komara Îslamî bin bo dewrlêdana wan dorpêçan yan na.

Kirîzên aborî ên Îranê çêbûyê sîstema siyasî ya Komara Îslamî ya Îranê ne, û bi gotineke din ew kirîzane sîstem in heta eva ku demkî bin, yan encama siyaseta vê yan wê hikûmetê, yan vî baskî û wî baskê din ê rejmê bin. Berî dorpêçên navdewletî, û herwisa piştî rakirina pişka zêde ya van dorpêçan, ew kirîz hebûn û di çend salên dawiyê de heya kûrtir jî bûne. Kirîza aborî tevî kirîza civakî û jîngehî ku her hemû jî pêkve girêdayî ne, û çêbûyê sîstema siyasî ya Komara Îslamî ne, Îran gehandine ser lêva Kendal.

Nîşaneya vê yekê di serhildana cemawerî û berfireh ya zivistana par de me dît, ku carna li vir û li wir dom hebûn.

Ya rastî ew e ku Îran di rewşa şoreşê de ye, helbet sedema rûnedana şoreşê nebûna hevsozî û hevalbendiyê ye di nava çîna hejar û çîna naverast ji aliyekî, û ji aliyekî din ve nebûna hevpeymaniya di navbera neteweya Fars û neteweyên din de, ku ew yek jî di goviya xwe de vedigere ser nasiyonalîzma Fars ku rûxandina Komara Îslamî bi hilweşandina Îranê, û jinavçûna serdestiya neteweya Fas dizane.

Rola xapandinane ya bi nav reformxwazan di navxwe û di asta navdewletî de faktereke din ya girîng e, jiber ku ew rejîmparêz in, ne reformxwaz. Bêguman tirs ji serkuta bêrehmane û herweha tirs ji vê ku Îran wekî Sûriye yan Îraq rastî şerê navxweyî û kêşeyên zêdetir bibe, tirsek e ku Komara Îsalmî ji riya piropagendeyên tevalî ve bihêz dike, ew yek jî di destpênekirina şoreşê de, serbarê başbûna rewşa şoreşê rol dilîzin.

Heya vê demê ku rohn dibe ku Îran amade dibe digel Amerîkayê rêkkevtineke nû bike yan na, zexta Amerîkayê bo hevkariya hinek welatan di Rojhilata Navîn de, ku ewlehiya wan bi sedema siyasetên şerxwaz û têkderane yên Komara Îslamî ketine metirsiyê de, ew kirîznên navxweyî ên Îranê kûrtir dikin. Rohn nine ku Amerîka bi dana îmtiyazaê bi Çîn û Rûsiyê, herwiha bi zextxistina li ser welatên Ewropî bikare serkevtî be, ku wisa bû li kurtheyam de Komara Îslamî lawaztir dibe, û siyaseta herifîna wê kûrtir dibe.

Hekî siyaseta îdareya Trump di hemberî Kureya Bakur de bikin bingeh û îdareya Trump tê de serkevtinê bi dest bixe, eva egera wê zor e ku Îran razî be bi mercên Amerîkayê, û li hember de dibe ku Amerîka di goviya xwe de, mana rejîmê garantî bike, û (Wezîrê karê derve yê Amerîkayê bi eşkereyî got ku hekî Kureya bakur derheq damalîna çeka navikî razî be, ew mana vê rejîmê garantî dikin).

Helbet di demekê de ku Kureya Bakur mana rejîmê bo wê li serveyî her tiştî ye, Komara Îslamî bernameya mûşekî û nifûza xwe di navçê de jê re girîng e, û bi cuda nizane ji pirsa mana xwe. Dûr nine ku Îran dawî car amade be bo gotûbêja digel Amerîkayê, lê wekî pîşeya hertimî ew qas van gotbêjan dirêj dike, da ku îdareya Trump li ser kar nemîne, helbet eva ku pêşeroja Îranê yekalî dike, faktera derveyî nine, belkû dînamîka navxweyî ya Îranê ye, Komara Îslamî siyaseta derve ya wê gellek bilindfir e, wate siyaseta bidestxistina hejmoniyê di Rojhiata Navîn de, eva di dmekê de ye ku şiyana wê ya navxweyî nine, bo vê siyaseta bilindfirane.

Armanca îdareya Trump ew e ku bi sepandina dorpêçan bi ser Komara Îslamî de, û lawazkirina rejîmê, neçar bin ku cardin vegerin ser maseya gotûbêjê bo wajokirina rêkkevtineke din û berfirehtir

Komara Îslamî di Rojhilata Navîn de kariye ku bihêz be, lê di navxwe de lawaz e û gihîştiye ser lêva Kendal. Welatk ku li derve bihêz be, û di navxwe de lawaz be, û li ser lêva Kendal be, şiyana dana nirxa domandina bi bilindfirînê nine. Herweha bi sedema vê ku kirîzên avxweyî sîstemî ne, tenê bi guherîna rejîmê koma van neteweyan ku di Îranê de dijîn, û herwisa cîhana derve ji dest Komara Îslamî rizgar dibin.

www.siyasikurd.org

Çi demek bo nîşandana nerazîbûnan bicî ye?

Zanyar Sablaxî

Di heyama yek sala borî de beşeke berçav ji texên civaka Îranê bi sedema girîngîpênedana Komara Îslamî ya Îranê bi jiyanê û rewşa derbazkirinê, çendîn civînên nerazîbûnê di bajarên curbicur ên Îranê û li pêşberî demûdezgehên rejîmê bi rê ve birin, ku her yek ji wan bi awayekî bi hêceta nebûna îznê, neyasayîbûn, û birêveçûna di dema nebicî de, rastî tohmet û boxtanan hatin, û di encam de jî bêbersiv man.

Civînên nerazîbûnê ên maljidestçûyiyan û kêşeya perê wan ên li bankan de, civînên kedkaran bi sedema nedan û paşxistina mûçeyên wan, û kêşeya nebûna bîmeyê, û li ser kar derxistin, û civîna mamostayan, û ferhengiyan li hinek bajarên wekî Îsfehan, Şîraz, Tehran, Kirmaşan û …hwd, bi sedema xirabiya rewşa jiyanê û kêmiya heqdest û li dijî taybetîkirinê, perwerdehiyê, ku wergirtina mehane ji dersxwanan digre xwe, û ew jî li dijî yasya xwendina bi xorayî ye, bi rê ve çûn. Herwisa daxistina beşek ji bazara Tehranê jî beşek ji van hereketan bûn.

Eva ku çi yek ji van civînan bersiva erênî û dilxweşker ji aliyê rejîmê û demûdezgehên pêwendîdar ên xwe ve pê nehatiye dan, di Komara Îslamî de tiştekî carr û pêvajoyeke asayî ye, jiber ku ya ku bi awayekê pêwendî bi jiyan û derbazkirin û ewlehiya xelkê ve hebe, ji dîtingeh û baweriya rejîmê ve bêbuha ne, û cihê xwepêvemandîkirin û bersivdan û pêregihîştinê nînin, ne tenê her ew, belku girtin û lêdan û bêhurmetîkirin bi meşvanan, bi erka rejîmê û demûdezgehên serkutker û emniyetî ên xwe dizane, û di vê derheqê de ji tu zext û kerametşikêniyekê dest hilnagirin.

Her di vê çarçoveyê de, tenê di yek-du mehên borî de dehan û heta sedan kes ji beşdarên civînê çi ji maljidestçûyiyan, çi ji kedkaran, Ferhengiyan, û çi ji kolberan û kasibkarên li ser sênor hatine destbiser kirin, û digel çarenûsa nediyar berbirû bûne, ew pêvajoya jî, di reftarên dijmirovî û wan tundûtîjiyên zalimane ên rejîmê her di destpêka gihîştina Komara Îslamî bi deshilatê, li hemberî neraziyan de her hebûye, lê di her qonaxeke rewşa aloz ya rejîmê de asta ragirtin, û tundûtîjînîşandanan bi hêcetên curbicur ên nerewa zêdetir û berfirehtir bûne.



Di rewşa niha de ku rejîm li derveyî welat û derheq hilweşiyana Bercamê de xwe li jêr zextê de dibîne, û metirsiya ducarîbûna dorpêçên pêşîn berbirûyê xwe hest pê dike, di navxwe ya welat de serbarê nîşandana hemû cure zext û tundûtîjiyekê li hemberî xelkê nerazî, ew nerazînîşandan her wisa dom hene, û her carê û ji aliyê texekê, û li bajar û cihekî serî hildidin, û Komara Îslamî dixwaze vê rewşê zêdetir û brfirehtir bi kar bîne, û bo vê mebestê jî boxtaneke "dijî ewlehiya neteweyî" li her hereketeke bilome û her civîneke nerazînîşandanê bide.

Destpêka rewteke nû ji van tohmetan di axavtinên Wezîrê Perwerdehiyê yê rejîmê de bi zelalî derdikeve, ku piştî civîna nerazîbûnê ya mamostayan û ferhengiyan ragehand ku ew hereketane di rewşeke siyasî û taybetî ya niha ya rejîmê de, ne jîrane ye, û ne jî cihê qebûlkirinê ye. Bi berçavgirtina Vê rastiyê ku rejîm li derve tevdanîkar û di navxwe de jî kirîzafir e, pirs ew e ku gelo dema hêja û bicî ji dîtingeha rejîmê ve bo nîşandana nerazîbûnan û daxwaza maf û heqdestê hêjayî xwe, ew jî bi awayê aram kengî ye?!

Ya ku cihê jêhûrbûn û bêbandorkirinê ye, ew pîlana rejîmê û demûdezgehên wê ên serkutkar e ku bi xistina tirsê di nav xelkê û texên curbicur ên civakê, bandorê li ser nerazîbûnan û pêdagiriya wan li ser daxwazên xwe û pêdagirbûna wan li ser domandina nerazîbûnna nedanê, û berdewam bin li ser daxwaza mafên xwe, û hekî bi gotina rejîmê dema nerazînîşandanê ew be ku Komara Îslamî ya Îranê bê kêşe be, tu carî derfeteke wisa çê nabe, jiber ku navika rejîmê û siyaset û kiryarên wê kêşesaz in, û encama van siyaset û kiryaran jî bi zirara xelkê û dabînbûna mafên wan e.

Sivikatîkirina bi neteweya Belûç nerazîbûna cemawerî li pey xwe anî

Di doma sivikatîkirina bi neteweyên din yên Îranê, vê carê neteweya Belûç kirine armanc.

"Hemîd Semsam" endamê lêjneya Zanist a girûpa Edebiyata zanîngeha Azad a bajarê Zahidanê, bi belavkirin kurte vîdyoyekê di torên civakî de, ji dîtingeha faşîstî a xwe ve sivikatî bi neteweya Belûç û xwendekarên xwe yên belûç kiriye, û her ev jî bûye sebeba kerbvebûn û nerazîbûna xelkê parêzgeha Sîstan û Belûçistanê. Axavtinên vî mamostayê Zanîngehê yên derheqê Belûçan de, bûye sebeba nerehetbûn û kerbvebûna xelkê parêzgeha "Sîstan û Belûçistanê", û çalakvanên medenî, xwendekar û xelkê vê parêzgehê, û herwisa di piraniya deverên din yên vê parêzgehê xelk hatine ser şeqaman û meşên nerazîbûnê li hemberî van kiryarên faşîstî û nemirovî yên karbidestên rejîma Îranê lidar xistine.

"Sîstan û Belûçistan" yek ji hejartirîn parêzgehên Îranê tê hesibadin, û xweşbijêviya jiyanê di deverên vê parêzgehê de di asta herî xwarê de ye, û rejîma Îslamî a Îranê jî bi siyasetên nemirovî û faşîstî yên xwe, bizanebûn girîngiyên nade xelkê vê parêzgehê, û her eva jî mezintirîn sivikatîkirin e bi vê neteweyê.
Medyayên girêdayî rejîma Îranê bi wergirtina bûdceyeke zef, berdewam bi darêtina pîlanan û dirustkirina bernameyan, derheqê asîmilasyon û cudahîdanînê di navbera neteweyan de, û sivikatîkirin bi neterweyên din yên Îranê çalakiyan encam didin, û rayedarên rejîma Îranê di seranserê Îranê de vê bîrkirina paremayî ya xwe berfireh dikin.

"Angela Merkell" nîgeraniya xwe li hemberî çalakiyên leşkerî yên rejîma Îranê nîşan da

Serokwezîra Almaniyayê piştî hevdîtina digel hemkofê xwe yê Îsra`îlî, li hemberî çalakiyên leşkerî yên rejîma Tehranê di herêma Rojhilata Navîn de, nigeraniya xwe anî ziman.

"Benjamin Netanyahu" roja Duşemî 4`ê Hezîrana 2018`an, di bajarê Berlîn a paytexta Almaniyayê de digel "Angela Angela Merkell" civîn pêk anî.
Piştî vê civînê, "Angela Merkell" di civîneke rojnamevanî de, çalakiyên leşkerî yên rejîma Îranê di herêma Rojhilata Navîn de, metirsîdar da zanîn, û "Benjamin Netanyahu" jî di vê civînê de zêdebûna hejmonî û destêverdanên şerxwazane yên rejîma Îranê yê di nav karûbarên welatên herêma Rojhilata Navîn de, ji bo vêdedana beşek ji dorpêçên navdewletî yên li dijî Îranê ragehan. "Benjamin Netanyahu" di beşeke din a axavtinên xwe de got ku: "Di egera nemana dorpêçên navdewletî yên li dijî rejîma Tehranê, ew rejîma wê destên wê bigihîje perê zêde, û ev jî vî pereyî hemiyê ji bo alîkariya terorîstan û piştevaniya tundrevên binajoxaz dişîne.
Navbirî herwisa ragehandiye ku: "Rejîma Îranê ji bilî hêzên Spaha Pasdaran, kariye18 hezar hevwelatiyên Sûriyê yên şî`e meseb ji bo berjewendiyên xwe di vî welatî de rêk bixe, û serbarê zêdekirina van hêzane, hewla zêdekirina 80 hezar kesên din jî di mejiyê van de ye.Xomênî û herwisa Xamineyî rêberên rejîma Îranê, di demên berê de bas ji wê kiribûn ku, Îsra`îl şêrpnece ye, û hewce ye ku bilez li ser gerdûnê vêde biçe.

www.arsivakurd.org

35.mîn salvegera bidarvekirina 59 ciwanên Mehabadê

Di roja 12`ê Cozerdana sala 1362`an de rejîma Îran 59 ciwanên Mehabadê bi dar vekirin, jiber ku nekarî wan lawên şoreşger naçar bike ku serî bo deshilata zordar û dijîKurd ya wan bitewînin.

Piştî îdama wan 59 lawên Mehabadê Hemîdriza Celayîpûr fermandarê Mehabadê biryar dabû ku daxuyaniya îdama wan 59 lawên Mehabadê di bajar de belav bikin. Ew 59 lawên ku bi tawana pêwendiya digel PDKÎ hatibûn girtin.

Her derheq îdama van 59 lawên Mehabadê de, Birêz Mela Qasim Keleşî Endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ ku wê demê di vê girtîgehê de bû, ku ew 59 lawên Mehabadê tê de hatibûn ragirtin, hindek zanyarî dane malpera "Kurdistanmedia"yê.

Navbirî di vê derheqê de dibêje: "Di roja 27'ê Reşemeya sala 1361'an a Rojî, 59 kes anîn destbisergeha Urmiyê, û gotin ev kesane 59 xortên Mehabadê ne, û li ser pirsên siyasî hatine girtin, ji wan 59 kesan jî tenê du kes temenên wan 27 û 30 salî bûn, ên din 18 heya 25 salî bûn.

Yek ji wan xortan bi navê "Kemal" ku cihê razana min û wî cem hev bû, serpêhatiya xwe weha ji min re got: "Me her 59 kesan ji bo wefadarî bi gelê xwe mîna endamên Komeleya "J- k" ji hev re sond xwariye ku em îxanetê bi hev û bi tu Kurdekî nekin. Ji me re şanazî ye ku em li ser Kurdîniyê hatine girtin, lê ya ku me azar dide, ne ev e ku renge me bikujin, belkî ev e ku hêj temenê me kêm e, û me nekarî weke hewce xizmet bi netewa xwe bikin."

Qasim Keleşî di berdewamiya baskirina vê serpêhatiyê de dibêje:

"Ew kes, mirovên netirs û vêrek bûn, ji axaftina xwe de tu caran li hember wezîfedarên dewletê tirs nedixistin dilê xwe de, û gotinên xwe digotin. Rokejê em li benda xwarinê bûn û yek ji berpirsan rû li yek ji wan xortan bi navê Salih gotê: "Tu gelik zêde diaxivî û axaftinên te watadar in". Salih di bersivê de got: "Ji vê yekê piştrast bin, em ew 59 kes ji were tiştekî nabêjin ku hûn dilê xwe pê xweş bikin, emê her 59 kes bin, û bi îtirafa me yek kesê din jî nakeve destên we de, ji me re mirin ne girîng e, ya girîng ev e ku em li hember gelê xwe de wefadar û rastbêj derkevin".

Piştî wan axaftinan Salih birin, û zêde îşkence kririn. Rojekê ku em nêzîk 90 kesan di destbisergehê de bûn, çend wezîfedar (me`imûr) hatin destbisergehê û gotin ku ew 59 kes ji bo demjimêr 6'ê sibezû amade bin!

Piştî heyamekê dema malbata min hatin bo dîtina min, gotin ku pêşmergeyên hêza Bîstûn a PDK Îranê ji bo tolhildana 59 lawên Mehabadê, çalakî encam dane, û derbên giran li rejîmê xistine.

Bi bihîstina wan gotinan min hest kir ku her her 59 kes jî sax bûne û hatine bal min. Çimku ez ji wefadariya partiya xwe ji gelê xwe re piştrast bûm.

Cinayetkarê Qarnê û Qelatanê mir

Axûnd Xulamriza Hesenî yek ji cinayetkarên rejîma Îslamiya Îranê di Kurdistanê de, bo heta-heta bellaya wî ji xelkê Kurdistanê vebû.

Xulamriza Hesenî axûndê rejîma Îranê, naskirî bi Mela Hesenî li temenê 91 saliyê di bajarê Urmiyê de mir, û Kurdistan ji vî cinayetkarî paqij bû.
Xulamriza Hesenî heta pola şeşem ders xwendiye, û piştre li hewzeya Îlmiyeya Qumê de li cem axûnd Şerî`etmedarî dersa ayînî xwendiye, û pileya ruhaniyetê wergirtiye.
Hesenî di temenê 16 saliyê de, heya dawiya temenê xwe digel çekê jiya, û ew çek li dijî azadîxwazan û bi taybetî Kurdan bi kar anî.
Xulamriza Hesenî wekî axûndekî xwînrêj û zalim piştî şoreşa gelên Îranê bi fermî wekî nûnerê Xomêynî li parêzgeha Urmiyê de hate diyarîkirin, û wekî axûndekî ayînî-siyasî tevlî hizra tarî û teng ya Xomêynîzmê di Kurdistanê de dest bi şer û tevdanîkariyan kir, û bi dehan ciwanên Kurd ji aliyê navbirî ve hatin şehîdkirin.
Wî wekî celladekî xwînrêj roleke serekî hebû di şerê li Kurdistanê, û şerê li dijî PDKÎ.

Xala herî reş ya li ser eniya axûnd Hesenî êrîşa li ser gundên Qarnê û Qelatanê yên ser bi Nexedê bûn, ku di vê êrîşê de bi dehan hevwelatiyên Kurd bûne goriyê siyasetên şerxwazane ên navbirî. Wî kurekî xwe bi navê Reşîd Hesenî seba vê ku ser bi Rêkxirawa Fedayiyên Gel bû, radestî dadgehê kir, û piştre ew îdam kir.
Piştî mirina vî mohreyê rejîma Îranê li Kurdistanê, nûçegihaniya Fars derheq kesayetiya navbirî nivîsand:

"Hesenî di civîna endamên heyeta dewleta Îranê de nîşana "pileya yek ya cesûriyê" ji Ehmedînnijad wergirt. Ew nîşan seba derbazbûyiya xebata Hesenî berî şoreşa sala 1357`an, û şerê li dijî Kurd û şerê Îran û Îraqê bû". Nûçegihaniyên rejîma Îranê bêşermane bas ji şerê digel neteweya Kurd dikin, û ji aliyekî din ve banga azadî û pêkve jiyanê di nava gelên Îranê de dikin.

www.arsivakurd.org

Nerîna Lîderan

Muhsiniyê Êjêyî:

“ Çalakiya di Telegramê de dikare ku wekî tawan bê hesibandin”.

Melik Ebdullah:

“Ez şanaziyê dikim bi nerazîbûna ciwanên welatê xwe bi awayekî şaristaniyane”.

Demîrtaş:

“Ez pirr xemgîn bûm ku peymana HDP û partiyên Kurdistanî ser negirtt”.

Netanyaho:

“Me zanyariyên arşîva etomiya Îranê ya veşartî da Almaniyayê.”.

Zimanê şovînîsteke neteweya desthilardar di devê edîbeke Fars de geriya

Hizra şovînîstî ya neteweya Fars ev sedan sal e ku li ser neteweyên din de zal e, û wek hertim vê carê ji aliyê wêjevanekî naskirî yê vê bîra hişk ve, êrîş li ser zimanên din yên Îranê hatiye kirin.

Wêjevan û mamostayê zanîngehên Îranê, “Dr. Şefî`iyê Kedkenî” di nîqaşkirinekê de, bi zimanê sivik êrîş kiriye ser zimanên din yên Îranê, û gotiye ku: “Gelo çi miroveke gêj û nezan tê xwe hînî zimanên herêmî dike, di demekê de ku ev zimanane kesên wêjevan tê de nebûne, da ku digel “William Shakespeare” rikeberiyê bike”.
Li hemberî vê nîqşkirina hişk û dugm de, “Dr. Rehber Mehmûdzade” mamostayê zanîngehên Kurdistana Rojhilat û xelkê bajarê Şinoyê bi nivîsîna babeteke têr û tijî bersivek zanistî ji “Şefî`iyê Kedkenî” re daye, û hêza zimanê Kurdî ji bo vî wêjevanê şovînîst yê Fars şirove û zelal kiriye.

Ev êrîşa bizanebûn ku ji aliyê hindek kesên şovînîst yên Fars ve li dijî zimanan û neteweyên din yên bindest yên Îranê tên encamdan, ev yeka vedigere ser vê ku bi sedema hesta demargirjane ve ev qas zehmet nedane xwe da ku li ser zimanên din yên Îranê xwendin hebin, û îman û bawerî bi şiyana van zimanan hebin. Hekî ev edîbê Fars kêmekê jî xwendin li ser zmanê neteweyên din yên Îranê heba wê jê re eşkere bibûya, ku di nava neteweyên Îranê de bitaybet Kurd serbarê evê ku ji aliyê dagîrkerên Kurdistanê ve berdewam hewal heladina ziman û deb û nerîtên wê hatiye dan, lê belê bi sedema bihêzbûna ziman û kultura wê, kesên wekî Baba serheng Dedwanî (hevserdemê Rûdekî) Pîr Şalyarê Hewramî, Ehmedê Xanî, Mela Mistefa Bêseranî, Şêx Riza Talbanî, Qani`i, Hejar, Hêmin,



Şêrku Bêkes û …hwd, tê de hiketine, ku digel Hafiz, Se`idî, Firdosî û … hwd, di warê edebî de dikarin zoranbaziyê bikin.

Hindek ji nûnerên meclisa rejîma Îranê dosiyeyên gendeliya exlaqî hene

Hinek Nûnerên meclisê ku dibe nûnerê rasteqîne ên xelkê bin û bergiriyê ji mafê xelkê welat bikin, û bibin tirîbonek bo êş û azarên wan, niha dosiyeyên exlaqî hene.

Kesê bi navê Selman Xudadadî ku serokê Komîsyona Civakî ya meclisê ye, li ser fesada exlaqî dosiyeya wî çû Dezgeha Dadweriyê de, lê Dezgeha Dadweriyê ew bêguneh da zanîn. Lê hinek ji nûnerên muhafizekar pêdagiriyê dikin li ser dadgehîkirina wî, û wî tawanbar dizanin. Selman Xudadadî berê yek ji fermanderên Spaha Pasdaran bû, ku bi Hac Selman dihate bangkirin. Herwisa navbirî berpirsê giştî ê Îdareya Îtila`ata Erdebîlê bûye.

Mihemed Hesen Cemşîdî nûnerê Bêhşehrê û Hesen Siyêdabadî nûnerê Sebzwarê du nûnerên din ên meclisê bûn, ku bi tohmeta gendeliya exlaqî hatibûn destbiserkirin. Dosiyeyeke Selman Xudadaî himbêz kirina keçekê ye ku derheq kêşeyên pêwendîdar bi nexweşiya bavê xwe serdana ofîsa wî kiribû, û dosiyeyke din jî destdirêjiya navbirî li ser munşiyê ofîsa xwe bûye.
Lê niha ew serokê komîsyona Civakî ya meclisê ye ku dibe pirojeyasayên derheq jinan, ciwanan, kar û xisarên civakî û mijarên wek wê lêkolîn bike.
Xulamriza Katib nûnerê Germsar jî di hilbijartina meclisa nehem de rikeberê Perwîn Ehmedînijad bû, û li hember de serkevt, lewra wê demî dihate gotin ku bi qestî dosiyeyeke exlaqî jê re hatiye çêkirin. Lê piştra eşkere bû ku navbirî xwastiye destdirêjiyê bike ser du jinan di Fîlîpînê de. Wê demê navbirî ji aliyê polîsan ve rastî lêpirsînê hat, û piştî vê ku 500 Dolar jê wergirtin ew azad kirin. Herwisa xwediyê beşa asansoran di hotêleke Fîlîpînê doz li dijî Katib vekiribû, lê balyozxaneya Îranê ji riya pêwendiyên ku digel berpirsê hotêlê hebûn, ew mesele peçavtin.
Li ser gellek nûnerên din jî gotegotên fesada exlaqî heye, lê dosiyeyên wan kev rek li ser danîne, û nehêlane ku bikeve nav zar û zimanan. Di pêkhateya meclisa rejîma Îranê de, tenê mijarên weke destdirêjî û azara cinsî wekî gendeliya exlaqî tê binavkirin, lê kiryarên din ên wekî pêwendiya digel jinên soba (mucered) li jêr navên wekî sîxekirinê de tê pînekirin, û aliyê tohmetbar wekî tawanbar nahê naskirin.

Saziya NY du rê li pêş Husiyan danîn

Şanda NY di Yemenê de, ji Husiyên girêdayî rejîma Îranê daxwaz kir ku yan ji “Al-Hadida” vekişin, yan jî xwe ji bo derbeyeke giran amade bikin.

“Martin Griffiths” nûnerê NY di Yemenê de, roja Yekşemî 3`ê Hezîrana 2018`an, derheqê dawîhatina bi kirîza Yemenê, ji Husiyên girêdayî rejîma Tehran daxwaz kir da ku bilez ji bajar û bendera “Al-Hadida” de derbikevin.
Navbirî du rê li pêş Husiyan danîne, ku yan bi awayê tewaw bajar û bendera “Al-Hadida” biterikînin, yan jî wê berbirûyê êrîşeke giran ya artêşa Yemen û hêzên Hevlabendiya Erebî bibin.
“Martin Griffiths” ragehand ku, şerê “Al- Hadida” şerekî çarenivîssaz e, û tê texîmkirin ku, di wî şerî de artêşa Yemenê digel hêzên Hevlabendiya Erebî milîşên Husiyan ji nav bibin.Bendera “Al-Hadida” ciheke stratejîk û girîng e, û ji riya vê benderê ve alîkarî û çekûteqemenî ji Husiyan re têne gihandin.Di demên berê de jî serheng “Turki Al-Malki” berdevkê leşkerî yê hêzên Hevalbendiya Erebî derheqê şerê Yemenê de, rejîma Tehranê bi vê yekê tometbar kiribû, ku ev rejîma ji riya bendera “Al -Hadida” ve alîkariyên malî, çek û teqemenî û mûşekan ji Husiyan re dişînin.

Xamineyî: Armanca Amerîkayê hiloşandina Komara Îslamî ye

Xamineyî bi tundî siyasetên nû ên Amerîkayê derheq Îranê û derketina ji Bercamê rexne kir, û di heman demê de heft şert û merc ji bo Ewropiyan danîn, ku hekî ew wan mercan bi cih bînin, ewê di rêkkevtinê de bimînin.

Rêberê rejîma Îranê di merasima fitarê ya berpirsên rejîmê de ragehand, ku ew nikarin aboriya welat ji riya Bercama Ewropayî ve baş bikin.

Wî şeş şert bona domandina Bercamê digel welatên Ewropayî xiste ber basê, û gef xwar ku hekî ew şertên wan cîbicî nebin, ewê çalakiyên berê ên etomî dest pê bikin.

Ew şert bi vî awayî ne:

Derkirina biryarnameyan li dijî Amerîkayê di Konseya Ewlekariyê de, behsnekirina li ser pirograma mûşekî û kiryarên herêmî ên Îranê di gotûbêjan de, garantîkirina ticareta digel Îranê ji aliyê bankên Ewropayî ve, garantîkirina firotina tewaw ya petrola Îranê, Tolvekirina wê bêqewliya berê, û dijayetiya digel tehrîmên Amerîkayê.

Wî derbarê şertê heftem de jî got: Hekî Ewropayî di bersivdana bi daxwazên me de derengiyê bikin, heqê Îranê heye ku çalakiyên nevikî ên xwe dest pê bike.
Xamineyî di axavtina xwe de îşare bi vê kir ku Amerîka dîsan wekî pisîka (pîşka) kartona "Tom" û "Jerry" wê şikestê bixwe.

Wî îdi`a kir ku ji sala 1357 (1979)`an ve Amerîkayê kiryarên curbicur ên siyasî, aborî, leşkerî, û piropagendeyî li dijî Komara Îslamî encam dane, û armanca wê jî rûxandina Komara Îslamî ye.

Herçend ku "John Bolton" şêvirmendê Ewlehiya Neteweyî ya

Amerîkayê di civînekê de ragehandibû ku ewê cejna sala 2019`an di Îranê de bigrin, ku merema wî hiloşandina rejîma Îranê bû, lê roja 23`ê Banemerê ragehand ku carê amanca Trump hiloşandina vê rejîmê nine.

Ew gefên Xamineyî di demekê de ne, ku her li bereberê vekişiyana Amerîkayê ji Bercamê bazara erz tevlîhev bû. Herwisa dewleta Rûhanî jî serbarê bikaranîna hemû hêza xwe ya polîsî û îdareyî, nekarî bazara erz kontrol bike, û nirxa Dolar gihîşte 7 hezar Tûmenî, û nirxa perê welatên cîran jî wekî Lîreyê Tirkiyê û Dêrhemê Îmaratê jî li hemberî diravê Îranê de gellekê bilind bû.

AKP`ê Îbrahîm Tatlêsis nexiste nav rîzbenda berbijêrên xwe de

Piştî vê ku Îbrahîm Tatlêsis navê xwe bi awayekî fermî wekî berbijêrê AKP nivîsand, û ew nûçe bû manşeta gellek ragehandinan, lê AKP piştî pêdeçûna bi ser van navan, navê wî ji rîzbendê derxist.

Çend rojan berî niha serokê AKP yê çiqa Urfayê di kanala TRT a Tirkiyê ragehand ku Îbrahîm Tatlêsis serdana ofîsa AKP li Enqeerê kiriye û navê xwe bo berbijêriya meclisa Tirkiyê nivîsandiye. Berdevkê AKP jî ew nûçe piştrast kiribû.

Lê duh hate ragehandin ku piştî belavbûna rîzbenda fermî ya kandîdan, navê Îbrahîm Tatlêsis tê de nebûye, û Tatlêsis di dema hevpeyvîba bi kanala xeber Turk re gotiye ku, dema min navê xwe nedît, min hest kir ku cardim mêjiyê min dane ber gulleyan. Ew hunermendê navdar ê Tirkiyê piştî dagîrkirina Efrînê ji aliyê arteşa Tirkiyê ve, digel Erdoxan çû ser sînor û meht û pesna serbazên Tirk kir ku xaka Kurdistanê dagîr kirine.

Belavbûna vê vîdyoya wî pêleke nerazîbûnê di nava Kurdan de li pey xwe anî, û ew wekî kesekî îxantekar bi gel û nîştiman hate binavkirin, û gellek alîgirên wî jî ew wekî keskeî berjewendîxwaz bi nav kirin ku xizmeta dijmin kiriye.

Her di vê derheqê de, li ser torên civakî gellek kesan nivîsandine ku dema Erdoxan û hizba wî karê xwe bi Tatlêsis dane kirin û hem armanca xwe pêkan, û hem jî ew sivik û rezîl kirin, êdî ew berdan û dest jê hilgirtin, ku eva jî encama xizmeta bi dagîrkeran e.

Mixabin mînakên weha di dîroka Kurd de gellek zêde ne, ku yek ji wan Hesen Xeyirî beg nûnerê Dêrsimê bû di perlemantoya Tirkiyê de. Wî di dema şoreşê de ji xelkê Dêrsîmê dixwast ku beşdariyê di şoreşê de nekin, lê serbarê vê hemû xizmetê bi Ataturk di dawiyê de her ji aliyê Ataturk ve biryara bidarvekirina wî hate dan.

60 hevwelatiyên Bîcarê sala borî hewla xwekuştinê dan

Di heyama sala derbazbûyî de, 60 hevwelatiyên Kurd (jin û mêr) yên xelkê bajarê Bîcarê hewla xwekuştinê dane.

Birêveberê Navenda Tendirustî û Dermanî ya bajarê Bîcarê bas jî vê kiriye ku, di heyama sala derbazbûyî de 60 hevwelatiyên vî bajarî hewla xwe kuştinê dane.

Li gora gotina vî berpirsê "Navenda Tendirustiyê" ya bajarê Bîcarê, ji wan 60 hevwelatiyên Kurd yên ku hewla xwekuştinê dane, 39 ji wan mêr in, û 21 jî jin in.

Birêveberê Navenda Tendirustî û Dermanî ya bajarê Bîcarê bas ji vê jî kiriye ku, di nav vê rêzbendê de, 32 kes ji wan xêzandar in, û 28 kesên din jî soba ne, û herwuha 15 kes ji wan di gundên derdora bajarê Bîcarê de jiyan dikin û 45 kesên din jî di bajêr de jiyan dikin.
Li gora gotina vî berpirsê Hikûmetê, ji koma van 60 kesên ku hewla xwekuştinê dane, çar kes ji van jiyana xwe ji dest dane ku, yek ji wan jin e, û yê din jî mêr in.
Li gora gotina karnas û çalakvanên warê jinan, nebûna yasyeke bihêz û kêmbûna navendên taybet ji bo piştevanîkirin ji jinên xesardîtî bi sedema xwekuştinê di Kurdistana Rojhilat, çend sedemên serekî yên xwekuştin û xweşevitandinê ne di nav jinên Kurd de.

www.arsivakurd.org

Rejîma Îranê di xwendingehan de sîstema "Şebab"ê ava dike

Spaha Pasdaran a rejîma Îslamî a Îranê, ji bo sîxorîkirina li ser dersxwenan de sîstema "Şebab"ê di xwendingehan de ava dike.

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê, ragehandiye ku, ev heyamek e ku sîstema bi navê "Şebab" ji aliyê Spaha Pasdaran a rejîmê ve di xwendingehên Îranê de hatiye avakirin.

Ev sîstema bi vî rengî ye, sîstemeke kompiyotêrî ya pêşkevtî ji bo xwendingehan dabîn kirine, û bernama taybet ya bi navê "Şebab" li ser wan kompiyoteran danîne, û kêysên wan kompiyoteran jî polomp kirine, û mafê tu kesî nîne ku dest li van kêysan bide.

Herwiha birêveberên wan jî neçar kirine ku, ji bo encamdana karûbarên întêrnêtî û kompiyotêrî, ji bernameya "Şebab"ê mifahê werbigrin.

Mamostayekî xwendingehê ku nexwastiye navê wî bê eşkerekirin, ji malpera "Kurdistanmedia"yê re ragehandiye ku:"Herçend ku rejîma Îranê di medyayên xwe de ev kiryara ji bo baştir birêveçûna karûbarên dersxwanan, û perwerdekirina di xwendingehan de ragehandiye, lê arm û polompa Spaha Pasdaran a rejîmê, û herwisa ev biryarên Spaha Pasdaran ji bo bikaranîna vê bernameyê, vê yekê nîşan dide ku, ev kiryara tenê ji bo sîxorîkirinê ye, û armanca polompkirina van kêysan, jî ji bo vê ye ku dibe hindek dezgeh di nav van kêysan de danîbin ji bo komkirina zanyariyan, û herwisa rasterast hemû dengên derdorê ji bo navendên Spaha Pasdaran bêne veguhastin, û li wir guhdariya wan bikin".

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê, bas ji vê kiriye ku, pêş vê ku ev kompiyoterane ji aliyê rejîmê ve bi wan xwendingehan bên dan, xwendingehan di cihê "internet"ê bi xwe "întiranet" hebûn, cudahiya van wir de ye ku bi întêrnêta rejîmê tenê melperên navxweyî yên Îranê dikarî çav lê bikî, lê di "înternêt" a berê de hemû malper dihatine vekirin.

Niha ku vê sîstema nû ya rejîmê, întêrnêta bihêz jî rakêşaye, û mamosta dikarin mifahê jê werbigrin, egera sîxorî û çavdêriya li ser mamostayan de gellek zêde kiriye.

Vî mamostayî di doma axavtinên xwe de gotiye ku: Hêviyê dikim ku mamosta ji vê pîlana rejîmê haydar bin, bila nekevine nav davka rejîmê, û di dema bikaranîna întêrnêta rejîmê gellek hişyar bin, û bi mobayl û kompiyotêrên şexsî yên xwe întêrnêta rejîmê kar nekin, da ku zanyariyên we ji bo rejîmê nehêne veguhastin.

Rewşa jin û zarokan di girtîgeha Weramînê de nebaş e

Rewşa giştî a girtiyên girtîgeha Weramînê nebaş e, û zarokên hepsiyên ku di vê girtîgehê de ne, bi dîtina mêran ditirsin.

"Zohrê Esedpûr" Çalakvana Mafê Jinan ku di girtîgeha Qerçek a Weramîn ê de hepsî ye, di raporekê de derheqê rewşa dijwar a jiyana jinan di girtîgeha Qerçek a Weramînê de, ku ji bo derveyî girtîgehê hatiye şandin, û di malperên nûçegihanî û torên civakî de jî bi awayekê berfireh belav bûye, gotiye ku: Fêkî û pincar di bernameya rojane ya girtîgehê de nine, û ava vexwarinê jî ber dest nine,û ava şor û tall jî ji bo şuştina kincan baş nine, û ji hevza biçûk ya ava vexwarinê dikarî ji bo şuştina didanan mifahê jê werbigirî, ew jî hekî derfet hebe, û zarokên girtiyan bi vexwarina vê avê, serûdilên wan têk diçin.

Herwisa navbirî di vê raporê de derheqê rewşa nabaş a derûnî ya ku li ser zarokan hakim e, ragehandiye ku ev jî ji ber mana dayîkên xwe di giritîgehê de neçar in di girtîgehê de jiyan bikin, û herwisa eva jî zêde kiriye ku, zarokên wan girtiyan bi dîtina kesên ku weke nûçegihan serdana vî cihî dikin ditirsin.
"Zohrê Esedpûr", çalakvana mafê Jinan e, û yek ji wan kesan e ku di meha Adara Îsal de, di doma civînên Roja Cîhanî a Jinan de, di pêşberî avahiya Wezareta Kar ya bajarê Tehranê hatibû binçavkirin, û ji wan jinan e ku niha di girtîgeha Qerçek a Weramînê de ye.

Girtîgeha Qerçek a Weramînê taybete bi xwedîkirina girtiyên jin e ku cezayên wan giştî ne, û li rojhilata bajarê Tehranê hilketiye, û zarokên biçûk yên wan girtiyan neçar in heyanî tewawbûna hayama hepsa dayîkên xwe di girtîgehê de bimînin û piraniya wan jî her di wan girtîgehan de û di rewşên nebaş û dijwar de ji dayêk dibin. Girtiyên vê girtîgehê rojane 8 demjmêran ji bo karxaneyên piştevan ku li jêr çavdêriya Dezgeha Dadweriya rejîmê de ne kar dikin, û heqdestê wan jî tenê ji %38-%54 ji heqdestê kedkarên Îranê tê hesabkirin.

Du milyon û 858 hezar malbat di Îranê li asta hejariyê de ne

Di Îranê de du milyon û 858 hezar malbatên hejar hene ku berpirsiyarên rejîmê dixwazin bi meaşek kêm vê diyardeyê nehêlin.

Nûçegihaniyên rejîma Îslamî ya Îranê di demekê de bas ji nehiştina diyardeya hejariyê di Îranê de dikin ku du milyon û 858 hezar malbatên di asta hejariya tund di wî welatî de hene, eve jî di halekê de ye ku dahata mehane ya her malbatekê di Îranê de dibe zêdeyî 3 milyon tûmenî be ku eva jî bi rewşa aboriya niha ya Îranê re neteba ye. Li gor statîstîkên rejîma Îranê, niha du cur hejarî (tund û herî tund) di wî welatî de hene.
Berpirsên rejîmê bas ji wê dikin ku piraniya malbatên Îranê di asta hejariya herî tund de dijîn, eva jî tê wê wateyê ku serperistê malbatê tenê dikare têçûya xwarina endamên malbatê dabîn bike. Hejarî û giranî di Îranê de roj li pey rojê li halê zêdebûnê de ye û berpirsên rejîmê jî tu pêngavekê ji bo çareseriya vê diyarde û pirsgirêka metirsîdar hilnagirin û tenê durşm û sozan bi xelkê didin. Ji aliyê din ve jî jordeçûna nirxa dolar di Îranê de bûye sedem ku nirxa tiût û miştan girantir bibe û evê jî valahiya tex û qatan zêdetir kiriye.

www.arsivakurd.org

Rêûresma “Roja Cîhanî a Zarokan” hate lidarxistin

Rêûresma “Roja Cîhanî a Zarokan” bi amadebûna zarokên kadr, pêşmerge û malbatên PDKÎ, di binkeya serekî a PDKÎ de hate lidarxistin.

Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê ragehand, roja Pêncşemî 10`ê Cozerdana 1397`an, bi boneya 1`ê Hezîranê “Roja Cîhanî a Zarokan” rêûresmek ji aliyê “Navenda Nêrgiz” a zarokên ser bi Hizba Demokrat ve hate lidarxistin.

Ev rêûresmê bi xwendina sirûda neteweyî a “Ey Reqîb” ji aliyê beşek ji zarokên” Navenda Nêrgiz” û çend ragirtina deqeyekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê pak yê şehîdên Kurdistanê bi taybet zarokên şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

Piştre peyama zarokên “Navenda Nêrgiz”ê bi boneya “Roja Cîhanî a Zarokan” ji aliyê “Rêzan Meqrozî” endama Desteya Birêveberiya “Navenda Nêrgiz” ve hate xwendin.
Piştî pêşkêşkirina peyama “Navenda Nêrgiz”ê, “Mistefa Hicrî” lêpirsyarê giştî yê PDKÎ bi boneya “Roja Cîhanî a Zarokan” bi taybet zarokên Kurd axivî.

Her di doma birêveçûna vê rêûresmê de çend sirûd ji aliyê zarokan ve hatine pêşkêşkirin, û herwiha ji bo rêzgirtin ji wan kesên ku di perwerdekirina zarokên Navenda Nêrgiz de çalak in, “Zemen Beharî” û “Zanyar Beharî” ji aliyê Mistefa Hicrî ve hatin xelatkirin.
Herwisa girûpa sirûdê ya zarokên “Neveda Nêrgizê” jî di vê rêûresmê de hatin xelatkirin.
Hêjayê basê ye ku, ev rêûresma bi nimayişkirina kincên Kurdî û cureyên dawet û dîlanên Kurdî ji aliyê zarokên “Navenda Nêrgiz”ê ve hatibû xemlandin.

Rêûresma 1`ê Hezîranê “Roja Cîhanî a Zarokan” bi nimayişkirina şanoya bi navê “Girane” ji aliyê zarokên “Navenda Nêrgiz”ê ve dawî pê hat.

Piraniya xwendingehên Îranê kavil in

Xwendingeh û dersxwanên Kurdistan û Îranê, li jêr deshilata berpirsên rejîma Îranê de ber bi wêraniyê ve diçin.

Mêhrullah Rexşanî Mêhr serokê rêkxirawa nûjenkirin, vegeşandin û teyarkirina xwendingehên rejîma Îranê di preeskonferansekê de bas ji vê kiriye ku %27 a xwendingehên Îranê di warê avahîsaziyê de wekî kavilbûyî têne hesibandin.
Navbirî gotiye ku %34 a wan, hewcehiya wan bi nûjenkirinê ne, û tenê %39 ji xwendingehan qahîm in.
Wî berpirsê rejîma Îranê di axavtinên xwe de bas ji vê kiriye ku 1 hezar û 700 polên dersgotinê di kanêksekê de bi rê ve diçin, û 987 polên din jî bi heriyê hatine çêkirin.

Navbirî di axavtina xwe îşare bi vê kiriye ku ew xwendingehên ku temenê wan 30 sal dibe, wekî kavil têne hesibandin.

Sala 1393`an berpirsên rejîma Îranê bas ji vê kiribûn ku sala nû ya xwendinê di demekê de dest pê kiriye, ku %50 ya xwendingehên vî welatî ji heriyê hatine çêkirin, û berpirsên rejîmê jî ew xwendingeh şibhandine bi bomba amadekirî bo teqandinê.

Rejîma Îslamî ya Îranê 36 hezra milyard bûdce bo sala 1397`an bo beşa perwerdehiyê daniye ku li çav sala borî, 4 hezra milyard kêmtir e.

Di pirojeyasaya pêşniyarî ya bûdceya sala 1397`an de bo beşa perwerdehiyê, 36 hezar milyard bûdce hatiye diyarîkirin, ku 2 hezar û 831 milyard Tûmen bo beşa birêveberiyê hatiye danîn, ku eva jî li çav sala borî zêdetir ji 42 hezar milyardî kêm kiriye.
Li gora amarên rejîmê %30 a xwendingehên Îranê dibe ku bêne herifandin, û %42 a wan jî sîstema wan a germkirinê tuneye, û di gellek parêzgehên Îranê de jî xwendingeh bi awayê kanêks û xîvetan hatine sazkirin.

Ji aliyek din ve jî Wezareta Perwerdehiyê a rejîma Îranê, şiyana dana mûçeyê mamostayan nine, û 6 hezra milyard Tûmenî deyndarê mamostayan e, û di dema xwe de nikare heqdestê wan bide.

Li gora madeya 30 ya yasay bingehîn a rejîma Îranê xwendin heya asta paşnavendî dibe bi bê beramber be, û bûdceya taybet bo bilindkirina asta perwerdê, tê amadekirin. Lê li hinek xwendingehan de heta 750 hezar Tûmenî pere ji dersxwanan werdigrin.

www.arsivakurd.org

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

Mînak 523/3 : Bi qertafa neyîniyê : Na/ne/ni : Çend bikaranîn :

a. Dibe nabe ez ê bêm salona konferansê.

b. Na, ew nikara beşdarî konferansê bibe.

c. Tu dikarî nikarî, ew kesên biyanî pê dizanin.

Ji helbestan : .../Ne bi gilî me/Ne demdemî me/.../A. Karabax

D) Ji aliyê hevoksaziyê ve hoker :

Ev peyv, di hevokan de ne wek hêmanên bingehîn in lê bo wan alîkar in;

giraniya alîkariyên van, xwe bi bandorî didin ser çalakiyên lêkeran.

Mînak 524 : Di hevokan de hoker : Çend bikaranîn :

1. Di qedînekan de : Piraniya wan bi wateya navdêrîn bikar tên :

a/1. Dotira rojê, li Berîvanê bûye reşbînî. a/2. Li Berîvanê çi bûye reşbînî?

b/1. Duh danê sibehê hîn germ bû. b/2. Duh kengî hîn germ bû?

2. Di avaniya dançêkir de :

a/1. Dar di tebaxê de dan birîn. a/2. Dar di tebaxê de dan birîn?

b/1. Payîzê xaniyek dan avakirin. b/2. Xaniyek payîzê nedan avakirin.

3. Di peyvên çêbiwar de : Wek rengdêr û navdêran bikar tên :

a/1. Saet ji şeşan re çaryek hebû, mirovê zûhatî diçû sûka kevnefiroşan.

a/2. Saet ji şeşan re çaryek hebû, yê zûhatî diçû sûka kevnefiroşan.

b/1. Saet ji nehan re pênc hene, kesên nexwendî li benda kê ne?

b/2. Saet ji nehan re pênc hene, yên nexwendî li benda kê ne?

4. Di erkên kirdeyî de : Piraniya wan bi wateya navdêrîn bikar tên :

a. Şeva dereng diboriya xemgîniyek dida ser dilêşa min.

b/1. Hatin nehatin bi meşan pêk tên. b/2. Hatin nahatin bona çi dibin?

Tiştonek

A: Mahir Berwarî

- Beg û megê têkbestî, her yê bi êş û nalîn e
Mîrê qeda lê şkestî, dest û pê lê dibestîne
Jiyê wî digihe sedî, ji serv e û bin ve hestîn e
Şikil kodê leşkirî, xwe li ber ava dixişîne
Wekî mar e bi serî, Yê bê bela û miskîn e

- Xişt û miştê-l hişkan e, dûv dirêjê sîng pan e
Lawu to pê bizane, yê bê soz û jivan e
Hema derket ji konê, xencer jehra li hewa ne
Gih gih korî serê tîj, karê wî pêvedan e

- Bi çîqu çîqal û çeng e, her yê bi şer û ceng e
Dest û pê wek silinga, ne yê zift û çeleng e
Ne yê bi jehr e wek stinga, yê bi heşt piyaw du çeng e

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arşivakurd.org

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (327)

Rêûresma Roja Cîhanî a Zarokan di binkeyeke PDKÎ de



www.arsivakurd.org